Efsane qonaxa yekem bû, û Felsefe qonaxa duym bû û ji xwe Ol ji qonaxa sêyem e, lê nakokiyâ vê gotinê xuya dibe weke têgîhişt me di dasasîna têgeha Olê de, û ew diroknişbi du layan li Olan dinîrin:

1-Li gorî yê ku bawerîyen xwe bi wan Olan dîkin.

2-Yen ku Olan erê nakin û bawerîyen xwe bi wan nakin.

Li ser van her du layan, besê yekê li Olan dinîrin wek gotinê pîroz ên Xweden e, û ev ji diçespîne û tekez dike ku Ol pişti Felsefê hatiye naskirin.

Ü li ser besê diwem, yên ku li Olan dinîrin wek kevneşopên gelemerki, û ew ji ser lîven kesan û xewnen pîran hatiye peydakîrin, ji vê hêlê em di karin bîbêjîn ku ew bi rasti jî berî Felsefê peyda bûye, lê ew bi xwe bi vî rengî ne Ol e, û bê guman ew û efsane be, belê bi vê wateyê ew ne Ol e!, û di encamê de, Felsefe ji Olên bibawerî, bi gelekî kevîntir e.

Dîmenen têkiliya Felsefê bi Olan re ev in:

Ol rîxistinék sincî, cîvakî, rîzamî û derûniye, weke her rîxistinék rîzaniya ramanî ya Rôjhîlatî yên kevînar e, tenê Ol bi perestinê de ji Felsefê cuda ye, ji ber ku Ol di rastiya xwe de rîxistinék Felsefî ye ji hêla wateyan û şîroveyen surîşî û paş surîşî ve, tenê bi perestin û tîrsa ji Dojehê cuda ye ji Felsefê!

Ü Felsefe ji rîxistinék Olî ye, lê ew dest bi gavê xwe dike di riya mejî û belgeyan, hûrbîni û lêvegeran, di riya gumanan de dijî û rîka xwe diyar dike di her mijarekê de ku ew pêşkeshi mirov dike, û Ol tenê ferman dide ku mirov li ser nivîsen wê erê bike di destpêk

- Yê ku bipêş nekeve bipas dikeve, ji ber ku jiyan bi bîyeren xwe her keli tişteke nû dibêje, li ber pîrsin hûrbîni guhêne me dîkişkîne, lewra divê nivîskar li pêla demî siwar be, pêla şemûs û bêcîr, û xwe bas bigre, bi berhemen xwe, bi ramânen û nerîmén xwe, xwe bide pêş ne be gewdê xwe, ne bi laşê xwe, ne bi gîvî û pelükirina bê cêj û rengi.. Ev serkeftinê xûz û seget ku nivîskarê me dixwaze bidest bixine, cihê sefeti û şermî ye..

- Wisa ji dûrkirin ji nakokiyen arzan, dê kî mîr be?

Ez dibînim, kîzîriya berhemdar ya bi rûmet ji mîrîtiya belengaz û sermîxum bi nîrx û şad û paktîr e.

- Partî û aliye siyasi desten xwe ji nav nivîskaran bîkşînîn û heger hun nikarin roleke erenî bilizin nebin kelemîn dirîndar û panaveke fereh ji nivîskar re berdin, ku hîkûfi xweza ya wî ya aferîniyî metîrs û netebîfî be, û hewl nedin hun wî girêdin bi pend û yase û şîreten ku kîzikekê têr av nakin...!!

- Bila bibe, heger hebe derfeta çekirîrina yekitiyeke bi sude ku karibe nivîskarê arezûmend di çarçûva xwe de bîhîwirine, û hewl bide bo damezrandina tevgerêke çandeyîf. Sazîyen nivîskaran xwezaya wan sivîl e, nekin siyasi û partîf. zeviyen kar pir in, gelî siyasetmedaran heger hun diz bin şevêne reş pir in...!!

Dilek Aşçı



berhemdar.

- Lê eger em di xêza xwe de herin û bênen û wek mîşa gîj vingvingê bîkin, û hêmîniya şaneşînê aferîneran şêlû bîkin, ji xwe ev weke tawanekê rewşenbîr tê wergerandin .

- Naxwe bila, û ev bi südetir e ku her cend nivîskaran ku nerînê wan nêzîki hev bin û karibin bi hev re ke-dekê bîkin, girîpîn taybîfî babetî cûr bi cûr ji xwe re damezîrinîn û alîkarî û danû standinê bi hev re bîkin. heta ku pirojeyek tevayî hemîyan bîcîvîne . Di vê derfetî de ji, ne pîwest e ku girûpek ji bi navê Yekîtiya Nivîskarê Kurd hebe, bila dibîn navekî taybet de bin.

- Sazîyen nivîskaran xwezaya wan sivîl e, nekin siyasi û partîf. zeviyen kar pir in, gelî siyasetmedaran heger hun diz bin şevêne reş pir in...!!

## Ol û Felsefe

## Û Pêwendîya Di Navbera Wan De

Ol bi tersê Felsefê dest bi gavê xwe dike, di rîka bawerîyan de Ol û Felsefe dijyekê hev in, di gîhiştina rastiyî de!

Ol rastîneyê dîghîne mirov li ser bîngeha ku Xweda bisa gotiye û bi vî rengi ferman daye, û Felsefe rastîneyê radestî mirov dike li ser bîngeha ku mejîyî mirov evan tîstan gotiye û peyda kîrîji, ji pişti ku li ser rastîneyê mijûl bûye û gelek lêkîlin û geryan kîrîji!

Ol ferman dide ku mirov li ser rastîneyê wê erê bike, ji ber ku ew rastîn ji gel Xweda hatiye nivîsandin û bo mirovahî hatiye şandin, û Felsefe li rastîneyê digere û gelek gumanan diçine da ku dîghîne wan rastîneyan. Felsefevanen Oldar gîhiştin rastîyekê ew ji ev e:

Ol û Felsefe her du hevkey in, ji ber ku her du ji li rastîyê digere û dixwazin, tevli ku rîka wan bo gîhiştina vê rastiyî ciya ciya ye. dibêjîn ku Felsefe hildiperike bi asmanan ve ta bîghêjê rastîneyê, û Ol ji asmanan de dibare bi barê rastîneyê!

Felsefevanen Peyxember in, û Peyxember ji Felsefevanen in, tenê rîka gîhiştina wan bo nasînê cûda û ne wek hev e, ji ber ku Felsefevanen û Peyxember li ser yek rîyî ne, her du ji yek armancê dixwazin û hêvî dîkin Felsefevanen li rastiyî digere û Peyxember rastî li ser wî dîbare û dîdikeve!

Gelo rast e wek ku dibêjîn hozanyar -

# Hunermend Se'îd Gabarî ji Bûyerpress Re: Şarîbana Kurdî û Şivan Perwer Stranê Min Dizîne..! (1-2)



- Strana min a yekem ji gotinê helbestvan Hadî Behlewî bû binavê "Ji Bo Xatirê Her Du çavan Dil Ketime Hemû çava".
- Wê demê tu kesî pirtûkên Seydayê Tîrêj nedixwedin, min bi riya stran û kasêtê xwe helbestên Tîrêj di nav millet de belav kirin.
- Ji berjiyana gundîti û hejariyê çavê min kul bûbûn û hêdî hêdî ez kor bûm, anku ev nexweşî ne zikmakîye, çavê min yê rastê mabû heta 1968an.
- Kurdisatana me wisa ye, "Emalet" û xayintî kirine şûşa koloniya bi wan re ye ji kê aciz bibin wê pê dakin û xelas.. bîhna wî derket..!
- Dawetên Dihokîyan hetanî sala 1996 an jî 4 stran bi Erebî bû, 5 bi Tirkî bûn û yek bi Kurdî bû..!!

- Girtina min a yekem di sala 1977an de bû, min li taxa Qedûr Beg dawet lêdida, emnê Sûrî ez ji wir birim û têr lêdan jî kirim.

## Hevpeyvîn: Qadir Egîd - Hewlîr

**K**urtejiyana hunermend Seîd Gabarî. Cihê jidayk'bûnê, jiyanâ gundê Xirbê Kejê û destpêka hunerê û xerîbiyê, tu çawa ji xwendevanê Rojnameya "Bûyerpress" re zelal dikî?

Min li cihekî di gotibûz li gundê Xirbê Kejê çêbûme lê ez vê şaatiyê serast dikim, li gor agahiyê birayê min yê mezin, ez li gundê Bêzara di 13ê heyva Ninsanê de jidayik bûme, lê li gor texmîna min ez di 24 heyva adarê de sala 1956an de jidayik bûme. Ji berjiyana gundişî û hejariyê çavê min kul bûbûn û hêdî hêdî ez kor bûm, anku ev nexweşî ne zikmakîye, çavê min yê rastê mabû heta 1968an, textorekî bi navê Ebdilkerîm Şedûd derziyî li min xist, nizanîm navê wê çi bû, piştî wê bi du seetan çavê min derket, valahiyek geleki nexweşî di jîyanê de çêbû, mero di 12 salî be, sêçar salan xwendibe, û têkeve vê rewşa han de, xelk bi destê mirov bigrin û hinex bibêjin rahêje kopal. Bi rastî -qonaxeke bi zehmetî min derbas kir, heft - heyst mehan ez bi şev randizam, rewsek piskolojî pir zor bû, bi şevê li nava gund digeryam.. Lê piştî dîtina Cegerxwîn û Seydayê Tîrêj û şiretenî li min kirin ta ku ez bi rewşa xwe agahdar bim û ji min re behsa Taha Hisen û Ebû El'ela Elme erî û xurtbûna hişê wan ji min re kirin, hêzeke xurt dane min.

Piştî çend heyvan min xwest ku ez li kolan û zikakîn gund biggerim û ez zanibim ku çend kolan û cihok û kortal jî hene. Di sala 1969an de tirêna min weke hafizekî kor ket ser demîr xwe de, wê demê gelek pere ji tune bûn ku ez tembûran bikirim, me ji xwe re qutik - mitik çedikirin û min hewil da ku ez rîkê ji xwe re hilbêjîrem û min têkîlyê xwe bi Cegerxwîn, Tîrêj, Hadî Behlewî re xurt kirin, û ez gelekî xembarê mamoste Behlewî û malbata wî û xelkîn Girzin tevan im, ew ji min re qonaxek geleki giring bû, ger ne ew bana min nedikarîbû ew qonax deh salan derbas kiriba, ji nişkave têkîlyê me çêbûn, di sala 70ê de min serdana wan li gund kir, min dît xelkin rewşenbir û zana ne, pêkenîna bi kesen kor li gel wan tune bû, vajî wilo rîz û hurmetê jê re digrin û dixwazin pêş ve biçe, û cara yekê min stran gotin, min yê mamoste Hadî Behlewî gotine mîna strana "Ji Bo Xatirê Her Du çavan Dil Ketime Hemû çava"

Piştî Seydayê Cegerxwîn çû şamê ez jî dûn ketim, lê ez nêzîki Seydayê Tîrêj mam, di warê helbestê de alîkariyek bê sînor ji min re kir, nizanîm min jî çiqas alîkari jê re pêşkêş kir, ji ber wê çaxê Kurdêne me 10% xwendevan "Tahir, Elî û Fuad" min derbasî

bûn, wê demê tu kesî pirtûkên Seydayê Tîrêj nedixwedin, min bi riya stran û kasêtê xwe helbesten Tîrêj di nav millet de belav kirin. Birastî wê serdemê de Tembûr û stran û gotin di nav Gabaran de geleki şerim bû, û ez vê yekê bi zelalî dibêjîm, gelekan nedixwesin ku ez herim malen wan, û hînekan min ji malen xwe derxistin û digotin madam tu li Tembûre dixe û te em kirine mitirb û qereci neyê mala me, ez karim navê wan eşkere bikim ew hîn sax in, ew yek ji ji hîleke civakî bû, tev ku Gabaran mirov in niştimanî û welat perwer bûn, kesen temen mezin ji hîla civakî ve min dişsandin, lê hîndek xorten wan jî hebûn alîkariya min dikirin.

Piştî salen 75-76an ew mesele ji pîvana Gabartiyê derket, gihiş Amûdê, Qamişlo, Aylan, Koçeran, Kobanî, Efrîn, piştî re têkîlyen min bi Cemîl Horo re û bi koma Azadi a Şamî re çêbûn, piştî re karê min berfîre bû, bi rastî ne min tenê ev kar kir, ez nabêjîm ez û ez, ji ber ku gotinek Kurdî heye dibêje "Ne kurmancê bê rez, ne koçerê bê pez, ne zilamê ku xelik nebêjîn filankes, ew tenê bêje ez û ez, jê neke hêviya bi lez û bez". Gelek xelik hebûn alfikariya me dikirin, piştî meha 10an ji sala 1977an rîjîma Sûrî em tengav kirin, mala me çû Qamişlo û min pir zehmetî li wir ji hîla ewlehiya siyasi, dawletê, û ya leşkerî kişand, yekî mîna Fotbolê min dida yê dî, piştî sala 1978an min nema karîbû herim şahîyan, du zarokîn min jî çêbûbûn, birçûbûn, hewcedarî hebû, hin partiyen li Kurdistana Tirkî li Nîsebinê û Cizîrî alfikarya min kirin, vêca Hikûmet bêtir li min tûj bû, di sala 1979an de meçbûr bûm çûm Kurdistana Iraqê, pêşî çûm serkirdayetiya demîkî cem rehmetiyê Samî Ebdirehman li devera Goya, wê demê rehmetiyê Cemîlê Sor, Cewher Namîq û Samî gotin min bira em nikarin te xwedî bîkin, ji ber em qeqol in û cihekî taybet ji me re tune ye, û tu ye û zarokîn te jî bi te re ne, eger tu herî Kurdistanê wê çêtir be, em ê navinîn bidin te wê ew li te xwedî derkevin, rabû ez hatim gel hevaleki jê re digotin Adil Hirûrî, ew jî di 81ê de hate girtin û şehîd bû, lê ew di 79an de li min gelekî xwedî derket û ez bi mamoste Tehsin Taha dame nasîn, wî jî ez anîm Hewlîrê û min bir radyoya Bexdadê, Tahir Tewfiq, Elî Merdan, û Fiad Ehmed da naskirin û wan jî gelek süde li min kirin di alîyî hunerî bitabet de warê nota mûzîki û meqaman de, min jî gelek saz çedikirin, wek a "Ey Bilbilê Dilşad" min çekir û min nizanîbû ci mqam e, wan ciwanmîren "Tahir, Elî û Fuad" min derbasî

akadîmiya (Hunerên Xweşik) li ser bingeha perwerde û pisporiyê kirin, bi rastî wastekarî bû, min du sal û nîvan de lisans bidawî kir, ji 736 şagirtan ez di pileya didwan de hatim, mixabin kecek li pêşîya min bû.

Piştî re di 14/6 sala 1981 xwepêşandanek li Hewlîrê lidar ket, em xwendevan bûn, em kişif bûn, me baz da û em çûn jiyana pêşmergetiyê, ez bûm berpîrsê koma şoressê li radyoyê, pêşî li Lozanî bû, dûv re çû Iranê, ez du caran li ser wan çiyan birîndar bûm. Piştî re me bîryar da ku ez dakevim nav millet, ji ber radio mîna zindanê çar dîwar in, hew tê nûçeya çê bike, şirove bike, û ez ji vê yekê aciz dibûm, ez hatim devera Badinan û bi destê Cehşîkîn Sedam ve hatim girtin ew jî di awiya 83an de bû, ji ber Pêşmergîtyê ez du sal û heyst heyyû 23 rojan di navbera Erbîlê û istxbaratê Mûsilî û Kerkükê li ber destê Elî Kimawî û dawî û Eboxirêb de mam, dûv re me radesî rejîma Sûrî kirin.

Li Sûrî xwestin me tazî bikin, min girtin û ji qazîve min berdan, ta ku ji millet re diyar bikin û bêjîn vaye me ew berda û mîrik zilamî me ye, eşkere ji min re gotin em te nagrin, eger em te bigrin em ê te bikin leheng, ma em dîn..??

Ebdirehman Nehar bi xwe ji min re got eger tu piştigiriya xortan bike ta xort herin çiyanê Tirkî şer

bikin em ê te berdin, û em ê te

bikin xwedî qdr û qîmet lê min

ev yek qet qebûl nekir, lê gelek camâren mîna mamoste Kemal

û Hemîd Hac Derwîş dev ji min

bernedan û alîkariya min kirin,

lê pîrsîrîk man berdewam, di

sala 1989 ez çûm Ewropa û min

jiyanek nû berdewam kir, di sala

1990î de me karek bi komeke

rewşenbir û hundermend re kir,

û derdora 17 partiyen Kurdî ku

em sistemekî bi navê "Hevkari"

deynin ta ku em karîbîn dengê

Kurdistan li Ewropa bîlind bikin,

hevkari ji her çar parçê Kurdistanê bû, ew jî du salan berdewam

kir, ev gaveke baş bû ji ber ku piştî

re hikûmetî Elmanî alîkaryâ min

kir û iqame û passport tevlî mafî

nasnameya siyasi dane min, û me

jîyek bi azadî û aramî ta sala

2004an berdewam kir rewşa min

ya derûnî gelek xerab bû, û li ser

daxwaza hevala ez hatim Kur-

distanê, û ta anha ez li vir im, lê

ez diçim Ewropa û ez têm, di sala

2012 de ji karek taybet ez çûm

Rojava û heşîkî mam, piştî re min

sê sal û şes mehan li Kurdistan TV

wek bêjer kar kir û çend heyvan

li telefizyonâ Hewlîrê ji min kar

kir, gelek taybendiyen min derbarî

pîrsa Êzdiyan de hebûn, di dema

helbijartinan de ez diçûm deveren

Şingelê.

- Helbestvanê mezin Cegerxwîn carekî gotiye "Eger milletê min niha qedir û qîmetê min nizanîbin, ez naxwazim dema ku ez bimrim hêşran li ser min bîbarîn" gelo mamoste Seîd Gabarî gihişte wî mafê han?

Di nav millet de belê min stendiye, di dema Cegerxwîn de tişetek bû û di dema min de tişetek din e, min di festivala Cegerxwîn de got kurd zindikû û mirî dost in, ta Cegerxwîn sax bû û xaniyê kirê de bû, û pişî mir ji nû ve kurd dibêjîn ax birawoo û festivalan çê dikin, ew nerîn bo wê demê bû, lê anha mumkin e, û ez vê yekê bi zelalî dibêjîm şerî min jî ji alîyê serkirdeyên Kurdi û partîyan ve tê kirin, Kurdisatana me wisa ye, "Emalet" û xayintî kirine şûşa koloniya bi wan re ye ji kê aciz bibin wê pê dakin û xelas.. bîhna wî derket..!

- Kî bêtir ji malbatê bandora xwe di warê hunerî de li Se'îd Gabarî kir?

Hunermend di malbata min de tune bûn lê diya min rehma xwedê lê be dengê wê pir xweş bû, ew mîna tomarkerê bû, li odeya apê min û bayê min ci bihata gotin wê jiber dikin, apê min Hecî Mihemed jî hem hestek wî netewî û welatparêzî hebû hem hin helbest dinîvisand, min helbesten wî jiber dikirin. Ew jî yek ji rî spiyyen ciwata Kurdi bû û bandora wî li ser min hebû

- Te gelekî ji herdû helbestvanan re Cegerxwîn û Tîrêj re strayê sedem ci ne?

Na min ji gelekân re straye lê ev kes destpêk bûn li gorî têkiliyên min bi wan re, lê min piştî wê ji Ehmedê Şêx Salih re gotiye:

"Şoreşa Pak û Nehêl û Xanadan", min ji rehmetiyê Emerê Le'lê re gelek gotiye, mîna "Xana Bindest" û "Yarek Min Heye" ji Yusif Bezarî re ji "Hat Xweş Buhar Çûm Nav Gula" û "Koçê Me Bar Kir" û sala 1978an piştî re Mihmed

şêxo di sala 1986an de gotiye, û

"Yarek Min Heye Bi Navê Zin" a

Emerê Le'lê bû, pêşî min 78an de

gotiye, min ji gelekân re gotiye lê

ez neçar dibim dema ku ez behsa

yê destpêkî dikim behsa wan bîkim,

ji ber bandorek wan mezîn li ser min heye ta niha, û ew bûn

ê min bi millet dane nasîn, bêtir

Tîrêj ji ber têkiliyên wî bi birayê

min re hebûn û ew dihat mala me

û ez ji Cegerxwîn jî qut nebûm.

- Navdarya te ya dsetpêkî ji kîjîn stranê bû?

Destpêk bû, min du stran go-

tin, xelkê min nas kir, "Leyla

Qasim" û "Bilbilê Dilşad" bû,

min Leyla Qasim di dawîya sala

1975an de got û Bilbilê Dilşad di

26/11/1976an de min gotiye, di

wan her du stranen de ez hatim

naskirin.

- Cara yekê tu hat girtin sedem

çî bûn, tu çiqas ma, û li ku bû?

Cara yekê ez li Qamişlo sala

## Civaka Me û Tevna Civakî

**D**i salêñ dawî de di nava kurdan de mîna hemû miletên cîhanê sosyal medya bi rengekî mezin belav bû, û tevî ku li ser erdê ziman û hebûna wan nehatiye qebûlîrin lê di gelek rûpelêñ sosyal medyayê de zimanê Kurdî wekû zimanekî fermî ye û wek wî wekû zimanen din ên dunyayê tê bikaranin.

Kurd jî ji ber ku deveren wan ên ku xwe tê de bînin ziman û derdêñ xwe ragihînin tune ne, bi awayekî gelek berfîreh berê xwe didin sosyal medyayê ango tevna civakî û li wir derdêñ xwe parve dîkin û kulen xwe jihev re dibêjin. Kurd ku hinekî di van waran de nûne, disan jî gavêñ baş avetîne û hejmara wan têrê dike ku cîhan bibêje ku Kurd mîletekî gelekî aktîv in, li ser tevna civakî.

Tevîku gelek Kurd ne zimanê dayikî bi kartînîn û berê xwe didin zimanen Tirkî. Erebî, Farisi, Almanî, Ingilizî û Rûsî disan jî mijarêñ ku li ser Kurdan, jiyana wan ya rojane û herêmêñ wan di nave-roka xwe de hiltînin, beşekî gelekî mezin di tevna civakî de dîgrin.

Lê pirsa giring ku gereke mirov ji xwe bike, gelo Kurdan ji vê medyayê sôd wergirîtiye?

Mîna her tiştîn din li cîhanê sosyal medya jî şûrekî du alî ye û dikare hem karê mirov biqedîne hem jî zîrî bighîne mirov, derdor û civakê..

Lê mirov dikare derbarê Kudran û Medya civakî de xirab an jî qene baxive?

Di destpêkî de û bi taybetî di Paltalkê de Kurdan gelek saxen xwe vedan û gelek ji

kesen Kurd ên niha li ser asta civakê têñ naskirin jiyana xwe ya siyasi li Ewropa di Paltalkê de destpêkirin û piş re jî derbasî siyasetê bi awa-yekî normal bûn.

Bi taybetî li Ewropa û ji ber dûrbûna kesan ji hev û tunebûna jêderen agahiyen an jî kembûna wan, Paltalk şeweyekî gelekî bas bû da ku Kurd tê de bighêjin hev û bi taybetî jî di sala 2004an de pişti serhildana Qamişlo Kurdish li dezgehekê geriyan û hewcedariya xwe bi medyayê dîtin û Paltalk di wan rojêñ serhildanê de yek ji alavêñ herî giring bû di jiyana Kurden ku bi internêtê re didan û distandin..

Niha jî di salêñ dawî de Facebook û Twîter derketiye, bi giranî Kurden bakur Twîterê û Kurden Rojava jî Facebookokê bikartînin.

Di van herdû malperan de zimanê Kurdi tê bikaranîn, lê bi milyonan Kurden ku di van rûpelan de tevdigerin ji wan ancax ji sedi 20 ku zimanê Kurdi wekû zimanê Rojane û çalakiyan bikartînin..

Lê ji bilî bikaranâna ziman mijar ên danûstandan Kurdistan ne, gelek agahî, nûçê, bîranîn, çîrok, çand û huner, ziman û çalakiyêñ cuda reng li ser Kurden an jî bi zimanê Kurdi li ser tevna civakî têñ gotûbékirin.

Ev aliye pozitîv û qenc e ku Kurd tê de sôdê ji tevna civakî dibînîn û karê xwe pê hêsan dîkin, dengê xwe diğmin cîhanê lê dîsa Kurd jî mîna hemû miletên Rojhelatî li van deveran gemara xwe jî radixin ber çavan her wiha erîşan li dijî hev pêk tînîn.



Kawa Şêxê

Kurdan di paltalkê de gelek şâşî kirin heyâ gîha astekê ku gelek Kurdan nema karîbûn têkevin paltalkê de, ne jî nêzîkî wê bibin û asta Paltalkê daket heyâ gîha asta ku bû cihê şerm û cyebê û edî her kesi jî ber hebûna xwe di Paltalkê de fedî dikir, û dema ku civakê bixwesta arzanbûna çandekî nîşan bidin digotin Çanda Paltalkê ye, Dema niha jî bi heman şeweyê çanda arzan li deverna jê tê belavkirin lê hinekî kêmîtir.

Kurd di medya civakî de derewan dîkin da ku kesê pê re ne lihev kêm bikin.

Hin Kurd li dijî kesen ne ji Ol an jî partî an jî hemfîkira xwe dijberiyeke dijwar dîkin û bêtir perçeyen civaka ji hevketî bêtir dûrî hev dixin.

Li ser hin rûpelan Facebookê

mirov dikare agahî û tiştîn

giring bibîne lê ji ber ku

taybet e û girêdayî kesayeta

her kesi ye tiştîn arzan jî li

ser xuya dîkin.

Bi giştî Kurd jî mîna hemû miletên din ên Rojhelata Navîn in, li ber xwe didin, şer dîkin, lê di heman demê de xizmeta partîyen xwe jî dîkin, carna jê dibin oldar û netewa xwe jibîr dîkin, carna jê jî dikevin xizmeta dijmin û neyaran û mîna kewê ku li

ser xesfî bixwîne, refîn xwe jî tê werdîkin.



Ebdulselam Xoce

herwiha ji hêla rîxistinê mafî mirovan li devera me..!!?

sedem ci ne ku hewildan nayen kirin bo belavkirina têghîşînê di riya semînar de ta ku, bê diyar-kirin bê çîqasî bandora vê diyar-deyê, pêşî li derûnî û jiyana wê keçê dibe û li malbat û çivakê bi giştî jî dibe.

derbarî vê diyardeyâ bivek "xe-ter" e li ser civakê, pîwîst e ku mîkanîzmeke hûrbîn bê dîtin û ev diyardeyâ han bê hilbijartîn wekû tawanekî mezîn û malbat di despêkî de û di pey re civak, bên hisyarkirin ku ev tişte ku tê kirin gunehk mezin e derheqê keçan kêm temen de.

Hewildan erkekî sereye ku mirov li ser rawest e, û giring e, ku karekî lezgîn bê kirin ta ku sînorek ji vê diyardeyâ xerab û bivek re bête dîtin, û vê tawana ku hin malbat dîkin derheqê zarokên xwe de bibe mijareke sereye ji hikûmeta kantonâ Cizîre re! . Gelo wê dengê me bikin...??!

## Diyardeya Zewaca Keçen Temen Piçûk Li Devera Me.

**D**i civaka kurdî de, li Rojavayê Kurdistanê, û bi taybet di van çend salêñ dawî de, diyardeyîn berbiçav hatine diyarkirin û bandoreke neyînî li ser civaka kurdi kirin. ev diyardeyîn ku em ê tîrêjîn ronahîyê di vê babetê de bavêjin ser ku di vê gotarê de qet têrê nake..!, lê merov dikare bêje ku hewildanekî ji bo ku em zanibin ku ev diyardeyîn han çîqasî neyînî, "Selbi ne", li ser civaka me. Ji wan diyardeyîn ku ez dixwazim beha wan bikim, zewaca keçen temen piçûk û ên li jêr temenê 18 salî, li devera me, sedem û bandora wê li ser derûniya wê keçê û herwiha li ser malbat û civakî bi giştî heye. di van çend salêñ dawî de pir malbat û bi taybet ên xizan, keçen xwe di temenekî pir piçûk de, di dan temen mezinan, û bi bîhayekî pir kêm.

Derbarî vê yekê de rîxistinê navdewlefi hişyari dane ji metîriya vê diyardeyâ han, û yet ji wan rîxistina Hiyûmîn Rayts Woş ku doz li hemû dewletîn cîhanê kir ku vê mijara han berbiçav bigrin.

Rîxistin di daxwaza xwe de dide diyarkirin ku zewaca keçen li jêr

## Ka Em Li Vir Bin

"Gellekan xaniyên xwe firotin; xaniyê ku bi salan kar û xebat û rezîlî bo kirîna wî dîtin, bi hêsanî firotin, bêyî ku hêsirekê birjinîn."

**G**irêdana bi xakê ve, çûna ji welêt, koçberiya bêhempa, nasname, we-latparêzî, xinîz, perîşanî, û riya Ewropayê ya kuja.

Ev mijarêñ herî balkêş in di van rojan de, ku gengeş li ser dibin. Di évarê de dema ku tu di kolanen Qamişloye de bigeri, helbet wê dengê telefonan bala te biksine, her kesek bi hinek meriv an zaraken xwe re daxive.

Koçberiya bêhempa pirsine pirr mezin dertîne, ne tenê girêdayî ye bi nasnameyê, lê bi koçeriya Kurdi, û welatên gerok ve, dê ci bimîne ji stranen li ser xaka pîroz, an jî nalenala kurdan li bajaren Şam û Helebê, ku digotin (Xaka Qamişloka rengin em nadîn bi malê duniyayê).

Pirsgirêk rengin xerab dide, gelo ew ci yê yê bîhêle ku koçberek ciwan ji bajarekî mîna Qamişlo / Bajarevînê, şad be bi gîhiştina Ewropayê! Di dimena vîdiyoyêkê de ciwanekî kurd diaxive: "Yadê te digot tu nagihêjî, lê va ez gihiştî", gîrîjîna wî ciwanî pirr mezin bû, ta astekê ku tu dikarî bibêjî bê ev ji ci dojehê derketiye.

Minak pir in û çîrok pirrtir in,

gellekan xaniyên xwe firotin;

xaniyê ku bi salan kar û xebat û

rezîlî bo kirîna wî dîtin, bi hêsanî

firotin, bêyî ku hêsirekê birjîne.

Dibe ku sedemîn çûyîna her ke-

sekî cûda be ji yê dîtir, lê helbet

pirranya wan dilxweşîya xwe

tînîn ziman, tu dîb qey ev welat

tu carî ne warê wan bû, û nameyin

riji dişinîn şûnwarê xwe, nameyin

xwe wî welatî.

Pirsgirêk koçberiyê derûnî ye beriya her tiştî, ji ber mîletê ku li ser stranen xaka welat a zêrin, xwedî bûye, dê çawa bikaribe bi vê hêsanîye dev jê berde.

Kesen ji ber astengiyin siyasi koçber bûn nikarîbûn li hember kîriyaren desthilatdar li ber xwe

bîdin, û nikarîbûn bibin welatiyin baş

bo wî welatî.

Pirsgirêk koçberiyê derûnî ye beriya her tiştî, ji ber mîletê ku li ser stranen xaka welat a zêrin, xwedî bûye, dê çawa bikaribe bi vê hêsanîye dev jê berde.

Kesen ji ber astengiyin siyasi koçber bûn nikarîbûn li hember kîriyaren desthilatdar li ber xwe

bîdin, û nikarîbûn bibin welatiyin baş

bo wî welatî.

Ta dîb hêla asta ku cuda di navbera bay û zarokan de çedîbe, pir pend û reseniya xwe winda dike.

Nîrîna jorî.. rola bendor li ke-satiya koçber xuya dike. Lê roleka din li bajar an li welatê lê koçbûne zore dîksînîn. Ji kesayetiya xwe de, di karûbarê xwe de, di civaka xwe de.. wtd.

Belê. Bi rastî yê koçber jiyanekî nû dixwaze. Lê li warekî ne durist rastê, ew divê jiyana xweyi abûrî xweş bike. Lê li hemberi vî tiştî pir tehl dixwe,

pir tiştîn giran hiltîne, her gepek nan bi ziqûm e, her bînhek bi keser e. berê gotine (keribî zor e), û gotine: (sam sekire, lê welat şîrîntir e).

Koçkirin bi xwe tê wateya ku kesek an komek kes weke karwan koçber dîbin ji cih û warê xweye resen, cihê bay û bapiran, ta welatekî biyan, xurbet.

Koçkirin dema iro ku li welatê me dibe, tiştîkî ne durist e, ew tiştî liber çavê me çedîbe, belê.

Ji sedema kiriz û bûyeren şerê



Ebas Mûsa

Kesekî ku bikaribe 9 hezar dolar bide hev û têkeve şepêla koçberiyê mijareke pirr mezin e, û gellek kes súcdar in ci desthilatdar, an rikberî, yên ku ta anîha li ser vê qeyranê ranew-estiyane, lê koçberi bi vî rengê berfereh nema kîryareke kesayetiye, mijar anîha girêdayî nasname û hestê girêdana bi kakê ve ye.

(Li vir im, Nobedare û dîra gîzî me, Tiwa li hewşê, Nobedare tenûra dayka şérîn im), ev yek ji wan stranen bû ku Kurden lê guhdar dikirin dema diçûn Ewropayê, û nikarîbûn bi dîşadî bibêjin va em li wir in, iro li ser rîyên mirinê şepêle penaberan xwe dispîrin rîyîn nedîyar da ku bîghîjîn welatîn Rojava, welatî wan, bêyî hêsirekê birjinin, an li paş xwe binerin.

Dê stran bimînîn mîna birinekî di gavêñ me de, em li vir in, hûn ji li wir in, û di navbera me de tenê çîrok û hestê sexte, û nîvisa dîro-keke bê swedî, heye.

**Xerîbî Zor e (Şam Şekir e, Lî Welat Şîrîntir e)**

**W**eke Pînasîn, Koçberî, ew bi xwe barkirin ji welatekî ta welatekî din e, û em dikarin bêjîn ku ew kes bar dîkin weke kesane an weke malbat ji cih xweyî pêşin diçin welatekî nû hilbijartî bi sedema pir tiştan, wek çawa derfeta rewşî dide.

Pir sedemî koçkirinê hene, bi xwe merov dikare du sedemân an du beşî sedemân bibêjî.

Yek bi destê merov e, yek bi destê kotazoroye..!

Besê yekem ew e: Di pêşî de mirov li cihê aştî û aramî dîge-re, di dû re li cihekî abûrî xweş digere ku jiyana xwe û jiyana kesen bi me ve hatine girêdan, wek mal û malbat xweş û ges bike, angò bi kêf û reza xwe

Ji cihê bay û kalan bar dike... bi kurtegotinê: Koçkirina ji cihekî lewaz û tiral ta cihekî bi xêr û bêr.

Beşî duyem ew e: ku bi sedemâ desdarî an bi destê kotezorî merovan koç dîkin, û ev bi xwe pir zor e. ji sedemâ konevanî, olî û gelî.. an ji sedemâ

şer û pevçûna kesane yan şer û pevçû





Keça Kurd a bi navê Fatima Ghadan, li Norwêcê bû namzeta Şaciwanîya vî welatî.

Keça Kurd Fatima Ghadan ku xelkê bajarê Mihabadê ye û hemwelatiyê Norwêcê ye, ji bo pêşbirka şaciwanîya vî welatî bû berendam.

Li gel Fatma Ghadan bi gişî 12 jinen ciwan besdarê vê pêşbirkê dibin.

Derbarê besdarbûna vê pêşbirkê

## Peyva wendayî

1	2	3	4	5	6	7	8
1 N	E	W	A	L	A	M	B
2 A	X	A	L	I	T	A	I
3 È	F	R	E	B	Ê	L	B
4 L	I	B	I	N	F	A	E
5 Y	E	E	Y	E	Ê	M	N
6 L	A	M	B	Û	K	R	E
7 A	K	Ş	Î	R	I	M	B
8 N	A	V	Ê	K	Û	Ç	E

Bibe çûkê newala, nebe mirîşka nav mala. Axa li kêtê ye, mal li bin berfê ye.

Peyva wendayî: Ji 6 tîpan: Amûereke mûzîkê.

## Hejmara bûrî

### Tembûr


### ASOYÎ

- Cengeke Kurdistan kire du parce.
- Çîrok û gotinên berê.
- Wekhev, şalar.
- Ne bi tevayî (vajî), navekî kuran.
- Nivîsa mûzîkê.
- Kurê kur, zeman.
- Bêdengî û bêlivî, ji bo bersivdana bangê.
- Tersî kevin.

### STÛNÎ

- Post, ji pesnên keçan.
- Kesê afirandinê dike.
- Lîs (bê dengdêr), ji berhemên rojnamegeriyê.
- Binê kiras, koma lîstikvanan.
- Bajarekî li Tirkîyê, rojeke heftiyê.
- Bavê pêxember İbrahim (vajî).
- Cureyeke desmalenjinan (vajî).
- Navekî keçan (vajî), dara tirî.

Kurdî	
Xweş e	معادلة
Hevkêsi	اشتراك
Pişkarî	استغلال
Rencxurî	توافق
Pêlangêrî	تفق
tonêl	ازلام
destek	مطاق
Bêsinor	احتجاج
Nerazibûn	احتضان
Xweasêkirin	المفهوم الأعلى
Karsiparteyê bala	



## Xaçerêz

1	2	3	4	5	6	7	8
1							
2							
3							
4							
5							
6							
7							
8							



Federasyona Fitbolê ya Tirkîyê qebûl kir ku navê Diyarbakırspor bibe Kulûba Karê Sportif ê Amedê.

Federasyona Fitbolê ya Tirkîyê daxwaza berpirsên Diyarbakırsporê qebûl kir û bi vî awayî navê wê hate guhertin û bû Kulûba Karê Sportif ê Amedê anku Amedspor.

Serokê Kulûba Diyarbakırsporê Nurullah Erdem bi daxuyaniyekê lîga 2 ya Tirkîyê de cîh digre.



## Mamik ???

Tilîyek danîn li erdê.. pir in ji vir heyâ Serhedê..

Dipeyive bi navê Xwedê.. ew ci ye ?

bersiva 25an : kevçiyê xwarinê

## Hejmara bûrî

1	2	3	4	5	6	7	8
1 N	A		K	U	R	I	K
2	W	E	K		O	D	E
3 R	A	Z		A	J		S
4 Î	K			Î	N	A	K
5 S		E	V		N	E	H
6 I	R	M		T	E	V	N
7 P	A	R	T	Î		O	K
8 Î	S		Î	R	E	K	